
The United States Go
ith the unresolved mur
nternationally respect
arty, and two of his c
ahmoud Rasoul.

Credible evidence ex
ranian Ebassy were inv
ther things, the suspe
assports. Two of the s
ocal Iranian Embassy.

We urge the Governme
oncrete action to iden
or the attack. We beli

(A) To indict those

(B) To arrest and p

Belgeyeke nû li ser terorkirina Dr. Qasimlo hate eşkerekirin

»»»» R:8

Hinek ji hêzên opozisyonê hene ku li dijî daxwazên me ne di pirsa neteweyî de, yanî kêm û zêde wekî Komara Îslamî ne

»»»» R:3

Mistefa Hicrî lêpirsyarê giştî ê PDKÎ

Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

Duheftînameyek Siyasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî

www.agirimedia.org Hejmar (326)21-05-2018 Buha (1000) Tûmen

Bercam di "Koma"yê de ye, ber bi mirinê ve diçe?

»»»» R:5

"Mike Pompeo": Rejîma Îranê di dilê Ewropayê de terorê dike

www.arsivakurd.org

Mike Pompeo: Rejîma Îranê dibe reftara xwe biguhere

Kurdistanmedia: "Mike Pompeo" Wezîrê Karê Derve yê Amerîkayê stratejiya nû ya Amerîkayê derheq rejîma Îranê eşkere kir

"Mike Pompeo" di navenda "Heritage" de axavtina xwe li jêr navê "Piştî lihevkirinê: Stratejiyeke nû derheq Îranê" di çar biyavan de dest pê kir. Wî ragehand ku zexta malî ya bêmînak wê bixin ser rejîma Îranê. Duyem: Wî got ku wê alîkariyeke gellek baş di navbera Wezareta Karê Derve û Wezareta Parastinê de wê hebe, bona vê ku bikarin pêşiya her cure êrîşeke Îranê bigrin. Sêyem: Ewê ji xelkê Îranê piştgiriyeke berçav û xûya bikin. Di dawiyê de jî got ku Amerîka amade ye ku digel rejîmê bikeve nava gotûbêjan de, hekî rejîm reftara xwe biguhere.

"Mike Pompeo" Wezîrê Karê Derve yê Amerîkayê îşare bi vê rastiyê kir ku piştî lihevkirina navikî ew perê ku kete destê rejîmê de, bo xelkê Îranê nehate mezaxtin, û rejîmê ew pere ji bo bihêzkirina rola xwe di şerên bedel (niyabetî) de bi kar anî.

Wî ragehand ku Hizbullaha Lubnanê jî ji aliyê Îranê ve hate piştevanîkirin. Hêza Quds a Spaha Pasdaran jî di van salên dawiyê de bihêz bûye, û di dilê Ewropayê de terorê dike. Rêberên El-qa`îdeyê jî di Tehranê de ne.

Herwisa piştgiriya rejîma Îranê ji milîşên Îraqê, bû sedema êrîşa wan li dijî Kurdan.

Daxwazên Amerîkayê ji rejîma Îranê di 12 xalan de hatine rêzkirin, ku tê de bas ji devberdana rejîmê ji mehandina Uraniyomê, û îzindana bi Ajana Navneteweyî ya Têhna Navikî bo serdana ji nişkêve bo Îranê, û devberdana ji çêkirina mûşekên balistîk û devberdana ji destêwerdana di nava karûbarên welatên herêmê de û piştgiriya ji girûpên terorîstî dike. Herwisa daxwaz dike ku rejîma Îranê hêzên xwe ji Sûriyê vekişîne, û Erebesitan û Îmaratê nede ber mûşekan.

Hêjayî basê ye ku roja 27`ê Banemerê "Trump" di civîna bi sekreterê giştî yê "NATO"yê re ragehand: Hûn herin her cihekî, hûnê şûnpiyê çalakiyên têkderane ên rejîma Îranê bibînin.

Sergotar

Bazirganên xwîn û serberedayîtiyê

N: Kerîm Perwîzî

Sistema dîplomatik û hiqûqî ya cîhanî îro bi rengekî hatiye darêtin ku dewlet, têde biker û bandordarê serekî ne, û her welatek di vê sîstemê de normal hereket bike, dikare berjewendiyên hikûmet û berjewendiyên welatê xwe heta asteke mumkin dabîn bike.

helwêstên normal jî weke pêbendbûn bi yasa û peymannameyên navneteweyî ku ji bo aştî û aramiyê hewce ne, û riya bazirganiya serbest û azad vedikin, û vekirî jî dihêlin. Êdî eva ku di vê bazirganiya azad de, aboriyên gellek mezin, qazancên zêdetir dikin, tişteke xuya ye, lê welatên din jî dikarin heta astekê bexteweriyeke navgîn ji xelkên xwe re dabîn bikin.

Lê hekî hat û dewletekê hereketên normal tunebûn, di wê demê de çi wê biqewime? Gelo ew dewlet bi têkdana yasa û peymannameyên ku hatine erêkirin, dikare bibe tenê serberedayî zordarê di dever û cîhanê de, û dest bi ser hemû tiştî de bigire? Bêguman bersiva wê "na" ye, û çarenivîsa "SedamHusên", "Qezafî", "Hîtlêr" û ...hwd û gellekî ên din jî li ber çav in. Ku wisa bû dewleteke bi vî rengî çi dike? Sîstema cîhanê wê digel de çi bike?

Ji bo bersiva vê pirsyarê, bi rengekî zelal Sûriye û bi taybet Komara Îslamî a Îranê li ber çavên me ye.

Dewleta Sûriyê ku bi dehan hezar kesî kuştiye û bombeyên Kîmyayî li dijî xelkê xwe bi kar aniye, ji bo parastina tenê kesekî weke "Beşar Esed", xwe li xistiye himbêza Rûsiyayê, û Potîn ji bo wan diyarî dike ku çi bikin û yan jî çi nekin.

Di Îranê de, hekî rejîmeke demokratîk û normal li ser kar ba, ku cihê rizamendiya hemû neteweyên Îranê ba, wê demê di welatekî bi vî rengî de, ku renge di heyama 50 salên bê de, nifûsa wê ji 200 milyon kesî jî derbaz be, ku dunyayek samanên jêr erdê heye, dikare bibe welatek gellek bandordar di asta Ewropa û rojavaya Asyayê de.

Lê niha desthilatdariya Komara Îslamî ku li dijî hemû pirensîpeke cîhanê û li dijî aştî û li dijî pêwendiyên dostaneye, ji bo mana xwe neçar e hemû samana welat bi nirxeke erzan bifiroşe barzirganên Ewropî û Çînê, û kelûpelên hewce bi nirxa çendîn hindeyî xwe, ji heman bazirganên Ewropî bikire, û herwisa kelûpelên bênirx û nebaş yên Çînê jî bikire da ku jê re bike Dolar!



Di vê bazirganiya bixwîn de, welatên Ewropî samanên erzan dest xwe dixin, û bazareke baş di destê wan de ye ku bi navê dorpêça Amerîka û guhnedan li gef û cezayên Amerîkayê, kelûpelên xwe bi nirxeke giran bifiroşin rejîma Îranê, û rejîma Tehranê jî hem siloganên xwe yên li dijî Amerîkayê didomîne, û hem jî desthilata xwe bi alîkariya bazirganên Ewropî didomîne. Ya ku di vê navberê de ji nav diçe, serwet û saman û erdnîgariya welatekê bi navê Îranê û deryayek xwîna rijiyayî ya neteweyên rûniştiyê vê erdnîgariyê ne.

Gelo bazirganiya kompaniyayên Ewropî, li jêr navên birîqedar ên wekî guhnedan bi Amerîkayê, û di bingehê de, ji bo talankirina Îranê, û dotina vî welatî, dikare rûçikê xwe li cem xelkê veşêre, û neteweyên Îranê jî nakevin bîra derbelêdan li berjewendiyên bazirganên xwîn û serberedayîtiyê?

Vekişiyana bank û kompaniyayan ji Îranê dom heye



Bankeke Almaniyayê û kompaniyayeke Lehistanê bazirganiyên xwe yên digel Îranê sekinandin.

Piştî vekişiyana Amerîkayê û dubarebûna dorpêçan, bank û kompaniyên ku di Îranê de karê bazirganî dikirin, mijûlî sekinandina pirojeyên xwe di Îranê de ne, û di vekişiyana herî nû de, banka "D. Z" a Almaniyayê û kompaniya "P.J NiG" a welatê Lehistanê, çalakiyên xwe yên digel Îranê de sekinandin.

Li gora rapora nûçegihaniya "Routers"ê, banka "D. Z" a Almaniyayê ku nivîsîngeha Navendî a wê di bajarê Frankfortê de ye, ragehandiye ku, ev hemû cure guherînkariyên malî yên xwe yên digel rejîma Îranê wê bisekinîne, û herwiha kompaniya "P.J NiG" a Lehsitanê jî ku digel Îranê pirojeyên gazê hene, ragehandiye bi sebeba metirsiyên dorpêçên Amerîkayê, wan pirojeyên xwe yên di Îranê de sirr kirine.

Di çend rojên derbazbûyî de, kompaniya polasazî a Îtaliya û gemîvaniya Danimarkê jî bazirganiyên xwe yên digel Îranê sekinadin, û bi awayê giştî di dema vekişiyana Amerîkayê ji lihevkirinnameya Bercamê, kompaniya "Ir BAS", "Totall" a Firansayê, kompaniya Petrolê ya "Ênî" ya Îtaliyayê, "Sirîka Înirjî" a Birîtaniyayê, "Buyîng" a Amerîkayê,Tirombîlsaziya "Sîtroên" a Firansayê, "Zîmêns" a Almaniyayê û çendîn kompaniyayên din, piroje û bazêrganiyên xwe yên digel rejîma Îranê sekinadine.

Eva di demekê de ye, ku rayedarên rejîma Îranê ragehandine ku, ew bazirganiyên xwe yên digel welatên Ewropî de didomînin, û Ewropî jî li hemberî lihevkirinnameya Bercamê de vê pêbend bin, û bank û kompaniyayên Ewropî jî wê pirojeyên xwe yên di Îranê de bidomînin.

www.arsivakurd.org

Deqa hevpeyvîna TISHK TV digel Mistefa Hicrî lêpirsyarê giştî derheq biryara Amerîkayê li ser Bercamê û hin pirsên girîng ên rojevê

H: Sabir Fetahî

Pirs: Bi baweriya we, encama derketina Amerîka ji Bercamê dibe çi?

Bersiv: Encam ew bû ku bi bawera min beşek ji dorpêçan cardin wê vegerin ser rejîma Îranê. Jiber ku hinek dorpêç hebûn ku di serdema Obama de bi ser Îranê de hatibûn sepandin, lê piştî Bercamê hatibûn rakirin. Hinek ji dorpêçan ên NY bûn, û hinek jî ên Ewopayê bûn ku hatin hilgirtin, ew dorpêç carê venagerin ser Îranê, lê ên Amerîkayê wê cardin bi ser rejîma Îranê de bêne sepandin. Eva dibe sedema vê ku rewşa aboriya Îranê xiraptir be, û bi vî awayî wekî niha berdewam be, heya ku rejîm neçar be bê ser maseya gotûbêjan derheq van daxwazên ku Amerîkayê li rejîma Îranê hene.

Pirs: Yek ji seranên Meclisa Xibrigan a rejîmê ragehandiye ku Xamineyî li ser daxwaza dewletê Bercam qebûl kiribû, di vê derheqê de Rohanî hêlên sor derbaz kirine, lewra ew dibe ku hem daxwaza lêborînê ji Xamineyî û hem jî li xelkê Îranê bike. Gelo kêşeyên navxweyî formalîte ne, yan cidî ne?

Bersiv: Kêşe cidî ne, û heta ku rejîma lawaztir be, û xelkê Îranê wekî derbazbûyî bergiriyê bikin, û heya ku qeyran nehêne çareserkirin, kêşeyên navxweyî wê zêdetir bin, û ew kêşe berhema siyasetên wan ên şaş in. Niha tu kes ji wan hazir û amade nine ku wan şaşiyan bikêşe stûyê xwe, herweha em dibînin vê carê jî Weliyê Feqîh û dewlet dixin stûyê hevdu. Eva rewta vê siyasetê ye ku dema hikûmet lawaz dibe, pêk tê.

Pirs: Amerîka ji Bercamê vekişiya, em dikarin bi zelalî bas ji bedîla Amerîkayê bikin, vegeriyana dorpêçan hûn çawa dinirxînin?

Bersiva: Vekişiyana Amerîka ji Bercamê, -Trump di dema bangeşeya hilbijartinê de jî Bercam wekî yek ji xiraptirîn lihevkirinana di dîroka Amerîkayê de bi nav kir-wê demê ragehand ku ji Bercamê vedikêşe, û niha jî dixwaze ku wê emelî bike, wî jêve ye ku destê rejîmê zêdetir vekiriye niha, bona piştgiriya zêdetir ya terorîzmê û ….hwd, herwisa gellek belge niha ber dest hene, ku yek ji wan mînakan ew belge ne ku Îsraîlê nîşan dan, ku rejîm her di hizra mehandina Uraniyomê de bûye, û xwastiye ku çeka etomî bi dest bixe, û derev kiriye, digel civaka cîhanî. Ji aliyekî din ve jî destêwerdanên xwe zêde kirine , û Amerîka dixwaze ku detsên wê di navçeyê de kurt bike, û herwekî me di televîzyonan de dît, rejîma Îranê bona destêwerdana di hilbijartina Îraqê de gellek pere şandibû ku li ser sînore hatin girtin. Amerîka dixwaze ku destê Îranê di van karan de kurt bike, û heya hingê hem dorpêçên pêştir û hem jî ên nû wê bi ser rejîmê de bisepîne.

Hinek ji hêzên opozisyonê hene ku li dijî daxwazên me ne di pirsa neteweyî de, yanî kêm û zêde wekî Komara Îslamî ne

Pirs: Kak Mistefa we bas ji destêwerdanên rejîma Îranê kir, ku Amerîka dixwaze pêşiya vê yekê bigre, lê ji aliyekî din ve di hember de Amerîka naxwaze ku destêwerdanê di nava karûbarên navxweyî ên Îranê de bike, gelo cardin sepandina dorpêçan dikare bibe sedema dariman û rûxana Komara Îslamiya Îranê, bi baldan bi vê ku di Kureya Bakûr û di Lîbiyê û çend welatên din de me dît ku temenê wan dirêjtir kir, gelo çirkirina van dorpêçan dibe sedema rûxana Komara Îslamî?

Bersiv: Niha bas ji rûxanê nine ji aliyê Amerîkayê ve, Amerîka dixwaze ku wan bîne ser maseya gotûbêjê da ku daxwazên xwe digel wan bas bike, bigehîne encamê. Tecrubeya derbazbûyî nîşan daye ku rejîma Îranê li bin zextê de, dema ku lawaz dibe, û berev rûxanê diçe teslîm dibe. Me di dîroka rejîmê di çend qonaxan de dîtiye. Ya yekem di dema şerê Îran û Îraqê de bû, dema ku rejîmê serbarê gellek diruşman, û dana nirxeke zor, û dana gellek kuştî û birîndaran ji ciwanan dema ku hest pê kir ku nikare Îraqê têk bişkîne, teslîmî bû, û bi gotina wan Xomênî tasa jehrê vexwar. Qonaxa duyem her rêkkevtina Bercamê bû. Berî vê ku ew bê îmzakirin, me hemiyan diruşmên serkomar Ehmedînijad û berpirsên leşkerî me dîtin, ku digtin ew gemaro kaxezên diriyayî ne, lê di dawiyê de dem aku Weliyê Feqîh dît ku ew diruşm nikarin çareseriya kêşeyan bikin, me dît ku rêberê nizamê bi nihênî heta bi bêy vê ku serkomar bizane, nûnerê xwe şand Emanê û digel nûnerê Amerîkayê gotûbêj kirin û binêşeya îmzakirina Bercamê wê demê digel wan bas kir, we dît ku serê xwe jî tewand bo daxwazên wan, û Obama jî razî bû. Min di vir de guman nine, ku hekî di pêşerojê de ew bizanin bandora dorpêçan li ser wan zor e, û metirsiya rûxana aboriya wan hebe, vê cardin jî bê ser maseya gotûbêjan, û Amerîka dixwaze ji vê taktîkê mifahê wergire.

Pirs: Gelo vekişiyana Amerîkayê ji Bercamê, ma vê awansê nade komara Îslamî ku vê hemû hejariyê û rewşa xirap bixe stûyê civaka cîhanî de, ku dorpêçan bi ser rejîma Îranê de sepandiye?

Bersiv: Komara Îslamî vê yekê bi kar tîne, lê dema ku dorpêç rabûn, hemû civaka cîhanî û bi taybetî xelkê Îranê, şahidê vê rastiyê bûn ku piştî nemana dorpêçan, rewşa aborî, rewşa xirabiya jiyanê, bêkarî, nexweşî, di nav xelkê ranê de gellek zêde bûye, lê eva tiştek e ku berpirsên rejîmê jî îtirafê pê dikin, lewra hekî Komara Îslamî cardin bête ser van cure piropagendeyan, tu kes baweriyê pê nake.

Pirs: karê dijberên Komara Îslamî gelo bizehmetir nabe?

Bersiv: Rejîmên dîktator hindî ku ber bi rûxanê ve diçin, serkutê zêdetir dikin, û rêçare ji bo nehêştina arîşeyan tunînin, û hemû riyan di serkutkirinê de dibînin. Rejîma Îranê jî yek ji wan e, lewra bi bawera me serkut wê her berdewam be.

Pirs: Gelo piştî vekişiyana Amerîkayê ji Bercamê, gelo Ewropî

www.dengiswakurd.org

wê her di Bercamê de bimînin yan jî na, ewê jî vekêşin?

Bersiv: Dizanî, niha mesele, şerê berjewendiyan û ticaretê ye, Ewropî dixwazin ku bercam bimîne, lê ew jî digel vê ne ku dibe rejîma Îranê dest ji zêdexwaziyên xwe li derve berde, yarmetiyê neşîne bo terorîstan, û destêwerdanê neke di nava karûbarên herêmê de, û dixwazin ku bi cuda gotûbêjan bikin, lê hemû girêdayî ne bi vê ku rejîma Îranê, wê çawa bersiva van bide. Lê di dawiyê de hekî rejîm bi daxwazên wan razî nebe, di dawiyê de ew ticareta digel Amerîkayê naguherin bi ticareta digel rejîma Îranê. Ticareta wan di gel Amerîkayê çendîn hemberî qazancên wan digel Îranê ye. Lewra bi baweriya min cihê gumanî nine. Lê wê hewl bidin ku hem bercam bimîne, û hem daxwazên Amerîkayê cîbicî bin.

Pirs: Gelo bandora van dorpêçan li ser rejîmê dibe, yan li ser xelkê?

Bersiv: Em hemû Komara Îslamî nas dikin, û bi ezmûnekê ku me ji Komaar Îslamî heye, bi taybetî eva ku piştî Bercamê nîşan da, xelkê jêve bû ku êdî piştî îmzakirina Bercaêmê wê rewşa meîşetê, û kar û bijîwa jiyanê wê baştir be. Herwisa ew rewşa emniyetî ku li ser xelkê heye, wê aramtir be, û ew perê ku dest wan dikeve, di avadankirina Îranê de bi kar tîne, lê ezmûnê nîşan da ku hemû jî berevajî bûn. Lê em dibînin ku niha giranî çendîn hember bûye, mînaka zeq û berçav ya Tûmen e, ku zêdetir ji %50 di heyama derbazbûyî de daketiye, û ji bilî vê me dît ku ew perê ku piştî nemana dorpêçan bi dest aniye, bedela bikaranîna wê bo rehetiya xelkê bo terorîzmê û bihêzkirina maşîna şer ya Komara Îslamî bi kar hat. Lewra bi bawera min ew geamro bo xelkê gellek ferq nake, lê wê gellek bandorê li sîstema aboriya rejîmê bike.

Pirs: Dawî siyaseta Amerîkayê derheq Komara ÎSlamî dikare çi be?

Bersiv: Ew dixwazin ku Komara Îslamî wekî niha nebe, yanî destêwerdanê di nava karûbarên welatên navçê de neke, alîkariya terorîstan neke, û mafê mirovan di navxwe ya Îranê de binpê neke, hekî rejîma Îranê wan xalan qebûl bike, bi bawera min Amerîka tu hewlekê bo rûxandina wê nade, lê niha ew pirs heye ku hekî Îran ji Bercamê derkeve, û dest bi mehandina Uraniyomê bike wê çi rû bide, eva gellek girîng e, di vir de ye ku lê qebûl nakin. Gelo ew dijkiryar digihîje vê ku rejîm birûxe, yan na, eva girêdayî ye bi wê demê.

Pirs: Gelo niha bas ji rûxanê nine?

Bersiv: Eva ku bi eşkere radigehînin, ne ji aliyê Amerîka û ne jî ji aliyê welatên Ewropî ve siyaseta guherînê tuneye.

Pirs: Hekî siyaseta guherînê hebû, civaka navdewletî wekî altirnatîv dikare hisabê li ser çi aliyekî bike?

Bersiv: Eva pirseke girîng e bo xelkê Îranê û civaka navdewletî. Renge beşek ji vê ku Rojava bi giştî carê bîr ji guherînê nake, mesela altirnatîvê ye, renge heya pêkhatina vê alternatîvê carê ew pirsa her wisa bimîne, her di nav beşeke xelkê Îranê de ku dijberên rejîmê ne, dixwazin bizain ku piştî wê rejîmê altirnatîv çi dibe.

Pirs: Bo çi altirnatîvek çê nabe?

Bersiv: Opozisyona sertaserî gellek lawaz û neteba û bi cudahiya boçûnan in, lewra wan nekariye xwediyê bernameyeke siyasî ya hevbeş û xûya bin, bona vê ku hem xelkê Îranê û hem derve bizanin altirnatîv çi dibe, eva yek ji şansên Komara Îslamî ye. Lê hekî bas ji Kurdan bikin, ew ji derbazbûyî baştir in, û Navneda Hevkarî pêk hatiye û diyalogê dikin.

Pirs: Gelo bi raya we ew Navend xaw nine, yan di paraktîkê de tiştek hebe, ku me nezanîbe?

Bersiv: Aliyê herî kêm ê qazancê wê ew e ku hekî opozisyona Kurd ya Îranî cudahiya boçûnan hebin bi hev re, bedela şer û kêşeyan, di rûniştinan de çareser dikin. Raste renge nekariye bersiva çavnihêriyên xelkê bide, lê em nabe vê yekê jî destkêm bigrin, opozisyona Kurd ya Îranê bihêz be jî, rûxana Komara Îslamî jê re zehmet e.

Pirs: Gelo opozisyona sertaserî, çi daxwazek li we wekî opozisyona Kurd kirine?

Bersiv: Digel çend hêzên mezin ên Îranî em hevalbend in, em endam in di hevalbendiyê de. Di gellek xalan de em hevhizr in û hinek jî hene ku li dijî daxwazên me ne di pirsa neteweyî de, yanî kêm û zêde wekî Komara Îslamî ne, û me nekariye digel hemiyan li hev bikin. Lê niha baştir e ji derbazbûyî, û me kariye ku digel hinek ji wan li hev bikin. Pêştir her qebûl nedikirin ku em digel wan bas ji mafê neteweyî û federalîzmê bikin.

Pirs: PDKÎ Çawa dikare van derfetan ji bo berjewendiya Kurd bi kar bîne, ku niha ji aliyê civaka cîhanî ve zext û givaş li ser rejîma Îranê hene?

Lê niha ew pirs heye ku gelo hekî Îran ji Bercamê derkeve, û dest bi mehandina Uraniyomê bike wê çi rû bide, eva gellek girîng e, di vir de ye ku lê qebûl nakin

Bersiv: Em dibe rastiyan qebûl bikin, û bi taybetî ew guherînên ku di nava civaka Rojhilata Kurdistanê de pêk hatiye. Ya din jî civaka navneteweyî ye. Em nikarin li pey xeyalan bin, û siyasetekê bi kar bînin ku digel guherînkariyan yek nagire.

Pirsa duyem jî ew e ku em tûşî xeyalan û bilindfirînan nebin. Hêviya gencan cihê hurmetê ye. Lê hizba siyasî digel rastiyan e, û bi vî awayî dikare digel opozisyona Kurd û ya Îranî pêngav bi pêngav herin pêş. Herçend bernameyên piraktîkî me tunebin, û em li benda bûyeran bin, em nikarin bigihîjin armancên xwe.

Serekîtirîn erka “Mik Pompeo” sekinandina rejîma Îranê ye

Serekîtirîn erka Wezîrê Karûbarên Derve yê Amerîkayê, rûbirûbûn û pûçkirina her cure gef û metirsiyan e, ku ji aliyê rejîma Îranê ve ji bo civaka cîhanê pêk tên.

Tenê 23 roj li ser diyarîkirina “Pompeo” weke 70.mîn Wezîrê Karûbarên Derve yê Amerîkayê re derbaz dibe, û navbirî di vê heyama kurt de hemû hewla xwe daye, da ku riyeke baş ji bo çavaniya rûbirûbûna digel gefên rejîma Îslamî a Îranê peyda bike.
Herwiha navbirî bi vê armancê jî, serdana Brussels, Erebistan û Îsra`îlê kiriye, û digel rayedar û berpirsên wan welatan, derheqê gef û aloziyên rejîma Îslamî a Îranê,bi rengekê têrûtijî axivtiye.

“Pompeo” di serdana xwe ya bo Erebistanê ragehandiye ku: “Ewlehî û aramiya Erebistanê ji bo me gellek girîng e, û emê bi hemû awayî alîkariyê bikin, ji bo rûbirûbûna digel gefên rejîma Îranê, ku sebeba serekî ya hemû arîşe û natebahiyan di Rojhilata Navîn de ye, û herwisa alîkarî û piştevaniya terorîstan dike”.

Wezîrê Karûbarên Derve yê Amerîkayê di Îsra`îlê de jî gotiye ku: “Em bi giştî nigeranê zêdebûna wan gefan in, ku ji aliyê rejîma Îslamî a Îranê ve, li welatê Îsra`îlê tên xwarin, û rejîma Îranê jî dixwaze ku dest li ser hemû Rojhilata Navîne de bigire”.

Amerêkayê bi berdewamî ragehandiye ku: Lihevkirinnameya Bercamê tenê şiyaye ku beşeke biçûk ji metirsiyên rejîma Îranê, ji bo mînka metirisya destpêragihîştina vê rejîmê bi çeka navikî heta astekê çareser bike, lê ji bo çareserkirina çalakiyên mûşekî û destêvedanên têkderane yên vê rejîmê di devera Rojhilata Navîn û piştevanîkirina ji terorîstan, hewce ye da ku lihevkirinnameyeke hemû alî digel rejîma Îranê pêk bê. 12 rojan berî niha “Dunald Trump” ji lihevkirinnameya Bercamê vekişiya, û biryar wiha ye ku roja Duşemî 31`ê Banemera 1397`an, “Mik Pompeo” siyasetên nû yên welatê xwe derheqê rejîma Îranê de zelal bike.

Bercam di “Koma”yê de ye, ber bi mirinê ve diçe?

Mistefa Hicrî

Gelo Rejîma melayan cardin jî tasa jehrê vedixwe, yan qehremanane nermiyê ji xwe nîşan dide?

Civaka navneteweyî di destpêka dehka 80`î ya Rojî de, bi armanca razîkirina Îranê bona desthilgirtina ji mehandina Uraniyomê dewreke çalak ji gotûbêjan digel rejîmê dest pê kirin, û herçend ku encama vê gotûbêjê lihevkirinek lê ketiye, lê piştre derket ku Îranê derev digel wan kirine, û vê carê bi awayekî veşartî çalakiyên xwe bo mehandina Uraniyomê domandiye.

Lewra carek din Komara Îslamî kete bin zexta civaka navneteweyî bona vê ku bê neçarkirin ku mehandina Uranyomê di asteke nizm ya diyarîkirî de rabigre, lê Îran bi mercên girûpa 5+1 pêkhatî ji Amerîka, Birîtanya, Fransa, Rûsiya, Çîn û Alman û NY razî nebû. Lewra ew alî bi armanca serîtewandina Komara Îslamî bi mercên xwe, yekîtiyeke kêmmînak di asta cîhanê de pêk anîn bo dorpêçkirina Îranê.

Dewra Amerîkayê di van dorpêçan de dewreke sereke bû. Vê yekîtiyê, roj bi rojê dorpêç çirtir û zêdetir kir, û bi vî awayî aboriya Îranê xistine bêcaniyê, da ku Komara Îslamî kete qedeman. Lewra Xamineyî bi neçarî û bi navê nermî ji xwe nîşandana qehremanane (nermişê qehremanane) îzna îmzakirina rêkkevtina digel welatên 5+1 (Amerîka, Rûsiye, Çîn, Fransa, Birtanya û Alman) digel Îranê da. Ew lihevkirin di 27`ê Befranbara 1394`an di Viyenê li aliyê herdu aliyan ve hate îmzakirin, ku li Îranê bi Bercam hatibû naskirin, ku kurtkiriya “Bernamêyê Cami`ê Êqdamê Muşterek” (Bernameya têrûtejî ya kiryara hevpar) e.

Berevajiyê boçûnên Rojava û hejmarek berçav ji xelkê Îranê, ku jêve bûn ji rêkevtinnameya Bercamê ku dibe sedema vêdeçûna gemaroyan bi ser Îranê de, û beşeke zaf ji heyiyên vî welatî, ku bi sedema dorpêçan li bankên Amerîka û Ewropa dest bi ser de hatibû girtin tê azadkirin, û di encam de:

-Di navxwe ya Îranê de aborî vedigeşe, û xelkê bêkar û bi taybet ciwan kar dest wan dikeve, û jiyana wan xweştir dibe, Komara Îslamî bi sedema têkelbûna bi aboriya Rojava ji riya kompaniyên mezin ve sermayeyên xwe di Îranê de dixin ger, û bi rûyê xelkê Îranê de jî tê vekirin, û di vî warî de jîngeheke pirr ji serkut û zext û givaşa dijî azadî guhertin bi ser de tê, û bi awayek rêjeyî xelk dikare bi azadî henaseyekê hilkêşe.

-Di derveyî welat de Komara Îslamî dest ji destêwerdanên xwe di nava karûbarên welatên navçê hildigre yan kêmtir dike, palpiştiya ji terorîzmê kêm dike û bedela vegeşandina şer û tevdanîkariyê di navçê de dibe hêvinê aştî û seqamgîriyê. Eva bû ku tîma gotûbêjkar ya Bercamê piştî îmzaya lihevkirinê û vegeriyana xwe di Tehranê digel pêşwaziya bi hezaran kesî û bi taybetî ciwanan berbirû bûne, û wekî qehreman pêşwazî ji wan hate kirin.

Wê demê de bû ku me nivîsand ku di hevdîtinên xwe da digel Rojavayiyan, me bo wan şirove kir ku berevajiyê van boçûnan li derveyî welat rejîm ji wan destkevtên ku bi sedema nemana dorpêçan dest wan dikeve, bo vegeşandina siyasetên hertimî ên xwe ku bawerî pê heye, wekî palpiştiyeke zêdetir ya girûp û aliyên terorîst û pilanrêjî bo şer û ajaweyên tayifî ên zêdetir di navçeyê û zêdetirkirina cibelxaneyên xwe bi kar tîne, ne eva ku bo avedankirina welat û dabînkirina kar û dahatê bo xelkê bêkar bike.

Lewra di navxwe ya Îranê de bêkarî û giranî û dijwariya bijêwa jiyanê zêdetir dibe, û nerazîbûna xelkê jî digel serkut û îdam û zexta zêdetir berbirû dibe, û mafê mirov zêdetir bin pê dike.

Di wê demê de hebûna hinek kes û alî, ku bi çavekî rexnegirane ve li helwestên me dinihêrîn, û li ser vê baweriyê bû ku PDKÎ xwazyarê dijwartirbûna jiyana xelkê Îranê ne. Lewra ji rabûna dorpêçan pêşwazî nake, û niha jî bi çavgerandineke destpêkî bi ser jiyana xelkê, di navxwe ya Îranê, û kar û pilanên têkderane û şerxwazane ên rejîm li derve bi nirxa betallbûna sifreya xelkê û bilindbûna dengê nerazîbûna wan di rewşa niha de ku bûye serxetê xeberên rojane ên cîhanê, û hemû ew rastî bi eşkereyî li ber çavê cîhanê û bi taybetî dehan milyon xelkê Îranê ye, ku rojane digel de berbirû ne.

کیهان

دیدار خانواده‌های دو شهید نیروی انتظامی با رهبر انقلاب

گزارش خبری تحلیلی کیهان

اگر برجام را آتش می‌زدیم دلار ۷۲۰۰ تومان نمی‌شد

عضو شورای روابط خارجی آمریکا: برجام اقتصاد ایران را تضعیف می‌کند و زمینه‌ساز براندازی است

رهبر انقلاب: وزارت خزانه‌داری آمریکا اتاق جنگ علیه ایران است

Em rejîma Komara Îslamiya ranê bi sedema hemû netebahiyên serekî wekî birçîtî û binpêkirina mafên gelên Îranê, serkutkirina azasdiyan û hemû bedbextiyan di Îranê de û zêdebûna şer û malwêranî û nearamî û awareyiya xelkê navçeyê dizanin. Ezmûnên borî û îdeolojî û bîr ûrayên paşvemayî ên vê rejîmê dibêjne e ku çend dahat û xêr û bêrên Îranê zêdetir bê, diçe berîka berpirsên vê rejîma gendel, û ya din jî bo vegeşandina pilanên zêdexwazî û tevdanîkariyên li derveyî welat tê xerckirin. Di vê navberê de xelkê Îranê li bêparî û birçîbûnê de têne ragirtin, û yak u bo wan zêdetir dibe, serkut û bêdadî û roja reş dibe. Ku wisa bû vegeriyana dubare ya gemaroyan, gemaro ye li ser rejîma Îslamiya Îranê, lewra vekişiyana Amerîkayê ji rêkkevtina Bercamê wekî pênaveke nirxandî di ware ragirtina rejîmê di tevdanîkariyan û palpiştîkirina terorîzmê û kuştar û malwêraniya zêdetir ya xelkê navçeyê dizanin, û em hêvîdar in ku cîhan û bi taybetî Ewropa ndi dawiyê de, div ê pêngavê de, palpişt û alîkarê Amerîkaê be û bi vî rengî bi alîkariyua hemû aliyek detsê Îranê ji destêwerdanên welatên navçeyê û bi nirxa naanbirîna xelkê bo mebersên xwe bê kurtkirin.

Ezmûnên borî nîşan dane, ku Komara Îslamî dema ku rejîma wê di bin zextê de dikeve metirsiya darûxanê, amade dibe ku tasa jehra şikestê vex

Derheq Bercamê jî, hekî bi beşdariya Amerîka di gotûbêjan de Bercam giha encamê, niha bi vekişiyana Amerîkayê ew rêkkevtin ketiye Komayê de û be rbi nemabê ve diçe, tu bêjî şirîkên Ewropî di dawiyê d ebikarin Bercamê ji komayê rizgar bikin û riheke nû bibexşnê?
Yan wê bibin palpiştê Amerîka di biyavê sepandina dorpêçan bi ser Îranê de bi armanca amadebûna bo gotûbêjê û sazan li ser van xalkên ku Amerîka daxwaz li wan dike, û ewropî jî digel de hevhizr in?

Ezmûnên borî nîşan dane, ku Komara Îslamî dema ku rejîma wê di bin zextê de dikeve metirsiya darûxanê, amade dibe ku tasa jehra şikestê vexo, û gellek wisa xûya dike ku ew ezmûn dubare bibe, û eva jî girêdayî ye bi bandore zexta dorpêçan.

www.ersivak.com

Li serî dide, bona ku ji dest û piyan bêxe

Bextiyar Osmanî

Serê Amerîka û hevpeymanên wê li dijî DAÎŞ`ê di xala dawiyê de ye, û zordariyên Komara Îslamî jî hindî ku tê, zêdetir û berfirehtir dibin, û gef in li ser navçê, û heta berjewendiya welatên wekî Amerîka û Ewropa, bi awayekî ku hemû jî li ser destêwerdan û pîştevaniyên Îranê ji terorîzmê yekdest hatine deng. Herwisa kok û yekdeng in ku dibe sînorek jê re bê danîn. Hindî ku Amerîka ye, li siyaseta navneteweyî de bi girîngiyeke zêdetir ji welatên Ewropî ve dinihêre Îranê, lewra dema ku tê ser rêkarên piştgirtinên têkderane ji kiryarên Îranê, cuahî tê dîtin. Bo Amerîkayê piştî DAÎŞ`ê Îran e, dijminek ku nêzî 40 sal in, diruşma mirin bo Amerîkayê bilind kiriye, û şeqam û kitêb û rojnameyên rejîmê dagirtine, û wisa diyar e ku ji gotina wê bêzar û mandî nebûne, wek çawa ku tûşbûyiyên bi maddeyên sirker tûşî vam maddyan dibin, rejîma Îranê jî rast wisa lê hatiye.

Amerîka di vê heyamê de zêdetir siyaseta bergirîkirinê hebûye (cuda ji dewra Bûşê kur de) heya êrîşî kirin, lê piştî hatina ser kar ya Trump siyasetên nû ên çavnihêrnekirî ên wî, siyasetên wî derheq Îranê bi tewahî guherîn bi ser de hatiye, û siyaseta êrîş, û gef û ceza bi ser Îranê de bûye gotara zal di Koşka Spî de, û heta hevpeymanên wan jî di Ewropa û navçê de gefên Îranê bi cidî û girîng werdigrin.

Rêkkevtina Bercamê ku berhema serdema bergiriyê bû, rêgir bû ji siyaseta êrîşkirinê, lewra bo Amerîkayê pêwîst bû xwe jê derbaz bike, eva bû ku serkomarê Amerîkayê li 8`ê meha Gulana îsal de ragehand:

“Amerîka ji rêkkevtinnameya Îranê derdikeve”. Bi vî awayî dawî bi du salan dengûbasên derheq vekişiyana Amerîkayê ji rêkkevtinnameyê anî, û cîhan digel serdemeke nû ji berbirûbûna digel Îranê berbirû kir.

Heya niha xwast û rêkarên Amerîka derheq Îranê pêk tên ji hevkariya zêdetir ya hevpeymanên wê li dijî Îranê, dorpêçên zêdetir bi armanca pêşîgirtin ji piştevaniya malî ya terorîzmê, û pêşîgirtin ji vegeşandina çalakiyên mûşekî, û daxistina riyên gihîşina bi çeka navikî.

Evane ew rêkar in ku bi eşkere gehandine guhên cîhanê, û bo vê armancê ragehandiye ku hinek pêngavan hildigrin, û em dibînin ku di vê heyama kurt de bi gefxwarin û dorpêçan û niha jî bi derketina ji rêkkevtina navikî, beşek ji pêngavên xwe di piraktîkê de cîbicî kirine, û rewş ji bo pêngavên mezintir û bibandortir amde kirine.

Bihêztirîn û girîngtirîn aliyê hemberî Îranê li Bercamê Amerîka bûye, her vê yekê jî ew rêkkevtina xistiye nava dojehê de.

Ji aliyekî ve Îran nikare vekêşe, li ber vê ku hekî hilweşe, ew lihevkirin bi tewahî hildiweşe, û wê demê piraniya welatên cîhanê hevdeng û yekdeng li dijî wê rêkkevtinê, wê helwestê bigrin, û nikare xwe ragre, lewra daxwaza garantiya rasteqîne dike, ji aliyekî din ve berbesta ser riya her cure gemaroyeke Amerîkayê şikand. Man yan nemana Îranê li Bercamê cudahiyek wisa nabe. Amerîka hewl dide ku ji riya Kureya bakur ve, destên wê bigihîje van zaniyariyên navikî ku radestî Îranê kiriye, û hekî em bi hûrî li siyaseta Amerîkayê derheq Îranê binêrin, piştevaniya ji terorîzmê û çeka navikî rejîm xistiye rex yek, û bi awayekî pêkve girê dane, ku tu yek ji wan bi tenê nehêne vekirin, û wekî yek siyasetê, dikarin berbirûyê wê bibin.

Pêş derçûna ji Bercamê dorpêçên xwe li ser Spaha Pasdaran çirr kiriye, û dixwaze ku bigihîje rêkkevtineke hemû aliyane û rastîn û seqamgîr bi hevkariya hevpeymanên xwe digel Îranê, jiber ku li ser vê baweriyê ye ku li pêkhateya rizî ya rêkkevtina navikî nikare armancên xwe midsoger bike, û heta Feransî jî daxwaza rêkkevtineke wisa dikin.

Rejîma Îranê bi taybetî di welatên Sûriye, Yemen û Îraqê û herwisa di çendîn welatên din de, destêwerdanên eşkere li dijî serweriya wan welatan û berjewendiyên mezinhêzan dike, û hekî Amerîka yek bi yek li dijî van welatan helwestê bigre, eva ewê rastî nirxeke zaf û têçûna demê bibin, lewra digel vê ku Îranê bernade, lê di cihê vê de ku dest û piyên wê bibire, hewl dide bi êrîşa rasterast li navenda fermanên wan wate li mejiyê peykerê wan bide, bi vî awayî hem mêjiyê wê rastî lawaziyê dike, hem jî dest û piyên wê kurt dike.

Îran herçend ku wekî nerîteke hertimî komeke diruşmên tund dan, û vekişiyana Amerîkayê jî wekî bereketê da zanîn, lê nikarin li jêr bandora helwesta Amerîkayê xwe rizgar bikin, bi taybetî ku vê carê Xamineyî dibêje: Pirsa Amerîkayê pirseke cidî ye, yan dibêje mesele gellek hesas e, wek pêşbîn kirine Îran bi serşorî ve diçe ser maseya rûniştinê, û ji caran jî zêdetir serî ditewîne.

Herçend Amerîka yek-du car, ew jî virade-wêde nebe, bas ji rûxana rejîmê nekiriye, lê wisa dixuye bo guherîna rejîmê, Amerîka alîkar dibe, bi taybetî ku Trump wekî pênexweşbûn dibêje:

Rast dema ku ew qas nemabû rejîm bi tewahî birûxe, Obama bi lihevkirina navikî û hilgirtina dorpêçan, Îran rizgar kir. Yan dibêje:

Pêşeroja Îranê taybet bi xelkê wê ye, Eva nîşan dide ku hekî dorpêçên vê carê bibin sedema rûxana rejîmê, eva astengan jê re çê nake.

Ji aliyekî din ve zext û dorpêç qada leyîzê û baskên rejîmê zêdetir teng dike, û maskên ber çavên wan wê bêne vêdedan.

www.arsiv.org

Nerîna Lîderan

Zerîf:

“ Bercam nexweşek di halê mirinê de ye”.

Elîekber Salihî:

“Hekî bercam têk here,emê mehandina Uraniyoma %20 dest pê bikin”.

Demîrtaş:

“Pêşniyar dikim ku berbijêrên posta serkomariya Tirkiyê her yekê, çend mehan bixin girtîgehê de”.

Netanyaho:

“Erdoxan bila bedela dersa exlaqê, dev ji kuştara Kurdan berde.”.

Têkiliyên di navbera Tirkiyê û Îsraîlê de sar û lawaztir dibin

Piştî bûyerên bixwîn ên kertê Xeze û kuştara hejmareke Felestîniyan, Tirkiyê balyozê Îsraîlê ji Tirkiyê derkir.

Çend demjimêran piştî derkirina balyozê Îsraîlê ji Tirkiyê, Îsraîlê jî serkonsolê Tirkiyê li “Tel Aviv” de derkir.

Erdoxan jî roja Sêşemiyê bi tundî êrîşî ser Netanyaho kir, û ew wekî keskî regezperest bi nav kir, ku destên wî bi xwîna Felestîniyan sor bûye.

Piştî rexneyên tund ên Erdoxan, Netanyaho serokwezîrê Îsraîlê ji riya “Twitt”ekê ve bersiva Erdoxan da û ragehand:

“Erdoxan di nava piştevanên herî mezin ên Hemasê de ye, û guman tê de nine ku baş ji terorîzm û serbirrînê tê digihîje. Pêşniyar dikim bas ji exlaq ji me re neke”.

Piştre Netanyaho rû li Erdoxan dinivîse:

“Ewê ku bi hezaran serbazên Tirk bişîne bo dagîrkirina bakûra Qubris û Sûriyê, baştir e ku şîreta me neke, dema ku em bergiyê ji xwe dikin, li hemberî girûpa Hemasê de. Erdoxan kesek e ku destên wî sor in bi xwîna hejmareke zaf ji hevwelatiyên Kurd li Tirkiyê û Sûriyê, lewra dibe dawî kes be ku bas ji exlaqê şer ji bo me”.

Serokwezîrê Tirkiyê jî daxwaz ji welatên Îslamî kir ku pêwendiyên xwe digel Îsraîlê ragirin.

Niha Tirkiye serokatiya dewreyî ya Saziya Hevkariya Îslamî dike, û di meha Desamberê de bû ku li ser daxwaza Erdoxan civîneke vê saziyê bona mehkûmkirina biryara Trump derheq veguhastina balyozxaneya Amewrîkayê bo Urşelîmê bi rê ve çûbû. Roja borî her di vê derheqê de Konseya Ewlekariya NY jî civînek pêk anî, û welatên endam daxwaza vegerandina aramiyê bo herêmên ku rastî aloziyan hatine kirin.

Amerîkayê jî bi tundî êrîşî ser tevgera Hemas kir, û ew bi pêkanîna aloziyan tawanbar kir.

Tê pêşbînîkirin ku her biryarnameyek li dijî Îsraîlê bê pejirandin ji aliyê Amerîkayê ve bête vetokirin.

Bi dehan endamên Partiya “Vatan”ê tevlî HDP`ê dibin

Piştî gefxwarinên serokê giştî ê Partiya “Vatan”ê li HDP`ê, 90 endamên vê partiyê biryar dan ku tevlî HDP`ê bibin.

Di vê derheqê de serokê Partiya “Vatan”ê yê Amedê Selahattin Gonul ragihand ku ew û 90 kesên ku dest ji kar kêşane, wê deng bidin HDP`ê. Serokê giştî ê Partiya “Vatan”ê Perinçek tevî gefa daxistina HDP`ê, êrîşî ser Demîrtaş jî kir, û navbirî wekî endamekî PKK bi nav kir.
Demîrtaş ku niha ji aliyê HDP`ê ve wekî berbijêrê posta serkomariya Tirkiyê hatiye destnîşankirin ragehandiye, ku hekî ew bibe serkomar, ewê serokerkanê giştî yê arteşê ji ser kar vêde bide.
Wî pêşniyar bi Dadgeha Bilind ya Tirkiyê kirIye, ku hemû berbijêrên posta serkomariya Tirkiyê çend mehan bişînin girtîgehê, da ku tama mana di girtîgehê de bizanin.

Hêjayî basê ye ku Kurdên Bakûra Kurdistanê û Tirkiyê bi ser çendîn partiyan û bi taybetî bi ser AKP û CHP de jî parve bûne, û dengê wan di Tirkiyê de çarenûssaz e. Lewra hemû partiyên Tirkiyê qewlên curbicur didin Kurdan, û riyên curbicur bo xapandina wna bi kar tînin, bona ku bi dengê wan deshilatê bi dest ve bigrin. Hekî Kurd tenê dengê xwe bidin HDP`ê, digel endamêm HDP`ê ên Tirk ên çepgir, wê bikarin HDP di hilbijartinan de serbixin, û posta serkomariyê jî bi dest bînin.

Spaha Pasdaran ji bo jinavbirina Balyozxaneya Amerîkayê xelat diyarî kir

“Tevgera Dad a Xwendekaran” ragehandiye ku her kes ku avahiya balyozxaneya Amerîkayê ya di Urşelîm (Jerusalem)ê de biteqîne, ewê wî kesî xelat bikin.

Li gora raporên madyayên navxweyî yên rejîma Îranê, “Tevgera Dad a Xwendekaran”, piştî veguhastina balyozxaneya Amerîkayê ji bo Urşelîm (Jerusalem)ê, vê saziyê îlan kiriye ku her kes ku avahiya balyozxaneya Amerîkayê ji nav bibe, emê bi dana 100 hezar Dolarî wî xelat bikin. Herwisa roj Înê 11`ê Gulana 2018`an, Wezîrê Parastinê yê Îsra`îlê bi çûna bo ser bilindahiyên Gulan (Colan)ê, ji Beşar Esed serkomarê Sûriyê daxwaz kir da ku hêzên terorîstî yên “Quds” û “Qasim Sulêmanî” di vî welatî de derbixin.

Her di vê pêwendiyê de, rojnameya “Al-Jarida” a Kuwêytê jî ragehadniye ku, Amerîkayê çiraya kesk ji Îsra`îlê re pêxistiye ji bo kuştina “Qasim Sulêmanî” fermaderê hêza Quds ya drt bi Spaha terorîstî a Pasdaran a rejîma Îranê. Ji aliyekî din ve, vê rojnameya Kowêtî di raporeke xwe de belav kiriye ku, çavkaniyeke ewlehiyê ya Îsra`îlê di bajarê “Tel Aviv”de daye eşkerekirin ku, Amerîka û Îsraîl berê jî gihîştibûne vê qena`etê ku, habûna Qasim Sulêmanî di Sûriyê de gef e bo ser berjewendiyê her du welatan di deverê de.

Hêjayî basê ye ku li gora raporên vê rojnamayê, sê salan berî niha jî di serdema Obama serkomarê Amerîkayê de, Îsra`îlê ji bo kuştina “Qasim Sulêmanî” hewl dabû, lê Amerîka bibû sebeb da ku ev hewla Îsra`îlê bê necam bimîne, her ev yek jî bû sedem da ku di navbera wan dewletan de pirsgirêk derkevin.

www.ajansakurd.org

Belgeyeke nû li ser terorkirina Dr. Qasimlo hate eşkerekirin



US-AIDE MEMOIRE

ئەرشیفی شەریف هەژاری

passed on to the Ministry of Justice by the head of department II.4 in the Ministry of Foreign affairs on 22 August 1989

The United States Government wishes to express its deep concern with the unresolved murder on July 13 of Abdul-Rahman Quassemlou, internationally respected leader of the Iranian Kurdish Democratic Party, and two of his colleagues, Abdullah Ghaderi-Azar and Fadel Mala Mahmoud Rasoul.

Credible evidence exists that the Iranian Government and the local Iranian Ebassy were involved in this heinous act of terrorism. Among other things, the suspects reportedly held Iranian diplomatic passports. Two of the suspects sought the refuge and protection of the local Iranian Embassy.

We urge the Government of Austria to pursue prompt, official and concrete action to identify, arrest and prosecute those responsible for the attack. We believe such actions should include steps:

(A) To indict those suspected of responsibility;

(B) To arrest and prosecute any non-official, non-accredited suspects remaining inside Austria;

(C) To initiate Interpol red notices for all suspects and to use all available avenues o international cooperation to obtain any necessary evidence located abroad;

(D) If suspects are located abroad, to initiate and effect extradition;

(E) To declare persona non grata any foreign official accredited to the Government of Austria through his local embassy woh may be shown to have played a role in the assassination or its aftermath, to refuse a replacement, and to announce the intention to prosecute any PNG'd official if he or she were to return to Austria in the future.

We share your outrage at the repeated misuse of diplomatic status for the purpose of carrying out state-sponsored terrorist attacks on Austrian soil. In May 1987 the Libyan People's Bureau was implicated in an assassination attempt against a former Libyan ambassador turned dissident, Ezzedin al Ghadamsi.

The U.S. fully supports all firm and decisive action by the Government of Austria in order to make clear that it will not condone the use of its territory as a venue to organize and carry out state-sponsored terrorist attacks, including political assassinations.

All civilized states must stand together in our refusal to capitulate to state-sponsored terrorism. To do otherwise would place the whole world at greater risk to increased attacks by state sponsors of terrorism.

SHAREEF HAZHARIY'S ARCHIVE

(copied from the Austrian Foreign Ministry's documentation on the Ghassemlou murder; October 1997; Sissy)

SHAREEF HAZHARIY'S ARCHIVE

Mamostayekî zanîngehê li parêzgeha Silêmaniyê belgeyeke nû li ser terorkirina Dr. Qasimlo belav kir.

Şerîf Hejarî mamostayê zanîngehê li parêzgeha Silêmaniyê bo yekem car ji riya malpera “Kurdistanmedia”yê ve belgeyeke nû li ser dosiyeya terorkirina Dr. Qasimlo belav dike.
Ew belgeya helwesta dewleta Amerîkayê ya wê demê derheq terokirina Dr. Qasimlo nîşan dide, ku ji aliyê Wezareta Derve ya Amerîkayê ve bo dewleta Utrîşê hatiye şandin.
Wezareta Derve ya Amerîkayê di vê belgenameyê de bi dewleta Utrîşê ragehandiye: “Belgeyên yekalîker û bawerpêkirî di ber dest de hene, ku diselimînin ku hikûmeta Îranê û balyozxaneya Îranê li Utrîşê bi vê terorkariyê rabûne, û gumanlêkirî jî hilgirê pasportên dîplomatîk ên Îranê ne”.

Belgenameya Wezareta Derve ya Amerîkayê di 22.08.1989`an ji Wezareta Derve ya Utrîşê ve bo Wezareta Dad a Utrîşê hatiye şandin.
Şerîf Hejarî ku bergek ji vê belgenameyê bo “Kurdistanmedia”yê şandiye, dibêje: “Ew belgenameya û çendîn belgeyên din di meha “October” a sala 1997`an de ji arşîva Wezareta Derve ya Utrîşê taybet bi keysa terorkirina Dr. Qasimlo ji aliyê kurdnasekî Ewropayî ve hatine kopîkirina û hilgirtin.

Piştre min (Şerf Hejarî) daxwaza belgenameyan jê kiriye, û li gora vê ku wî kurdnasî lêkolîn li ser Kurd kiriye, û min jî çendîn belgenameyên veşartî û nihênî ên Birîtanyayê li ser Kurd û destnivîsên serkirdeyên Kurd (bi taybet yên ewên Rojhilat) daye vî kurdnasî, lewra min kariye ku vê belgenameyê û çendîn belgenameyên din ji kurdnasê Ewropî wergirim”.

Navbirî derheq girîngiya vê belgenameyê bi nûçegihaniya “Kurdistanmedia”yê ragehandiye: “Ew belge diselimîne ku Amerîka bi hûrî agehdarî terorkirina rêberekî ew qas mezin bûye, û bi hûrî jî zaniye ku çi kesanek bi vê terorê rabûne, û çi kesanek jî li pişt vê terorê bûne”.
Navbirî derheq sedemên vê helwesta Amerîkayê dibêje:

“1-Herwekî ku di belgenameyê de xûya dike, û Wezareta Derve ya Amerîkayê jî qebûl kiriye: (Herçend Dr. Qasimlo di wê serdemê de rêberê tevgereke partîzanî-şoreşgerane bûye, lê Amerîka qebûl dike ku Dr. Qasimlo rêberekî xwedî rêz û hurmet a navdewletî û cîhanî bûye), lewra li ber vê sedemê (li ber pêgeh û giraniya Dr. Qasimlo di asta cîhanî de) Amerîkayê ew helwesta (li ser kaxezê) hebûye.

2-Di vê belgenameyê de tê selimandin ku Amerîka girîngiyê dide terorên di asta navdewletî de, lewra wê terorê wekî teroreke dewletî ya rêkxistinkirî ya Îranî dizane, di pêxema rêgirîkirina ji terora navdewletî ya dewleta Îranê, û eva Amerîka vê daxwazê ji dewleta Utrîşê dike, wekî pêngavekê bo rêgirîkirina ji terora navdewletî ya rejîma Komara Îslamî ya Îranê.

3-Amerîka ji vê dîtingehê ve jî ku hem di wê demê de, û (heta niha jî) xwe wekî rêberê lîberalîzma cîhanî zaniye û dizane, neçar bûye helwestekê (li ser kaxez)a wisa hebe, di wê demê de jî pêşbazî hebûye digel bizavên komonîstî, lewra wisa dizanim ku bi helwesteke (li ser kaxezê) weha jî, xwastiye ku xwe rizgar bike ji berpirsyariya dîrokî û nebûna helwesteke eşkere û zelal di keysa terorkirina rêberekî ew hinde azadîxwaz ya bibandor!.

Herçend ku ew wekî (Şerîf Hejarî) heya niha jî bîr ji vê yekê dikim: Ku gelo bersiva Wezareta Derve ya Utrîşê bo vê nameya Wezareta Derve ya Amerîkayê çi bûye?! Ku heya niha eva jî bi nediyarî maye.

4-Di warê siyasî de jî ew belgenameya peyameke Amerîkayê bûye bo dewleta Utrîşê ku: (Amerîka agehdarî tawanên dewleta Utrîşê ye digel dewleta Îranê), vê peyamê watayên din jî dikare hebin. Eşkere ye ku dewleta Utrîşê renge jê têgihîştibe, ku Utrîş di hewl de bûye pêwendiyeke aborî ya bihêz digel Îraneke dijî Amerîkayê ava bike, Amerîka jî bi vê nameya rasterast vê peyamê digehîne Utrîşê ku wekî Amerîka em aghedarî têkiliyên we ne digel Îranê, û bi vê yekê jî her xwîna bîrmend û rêberê xwendingeha “şoreşgerê hevdem” kirine goriyê berjewendiyên navdewletî”.
Dr. Ebdulrehman Qasimlo rêberekî hilkevtî ê pirr ji şanazî yê gelê Kurd e, û PDKÎ di qonaxeke dîrokî ya gellek hestiyar de, bi bîr û hizra geşexwazane ya xwe rêberî kir.
Dr. Ebdulrehman Qasimlo roja 22.04.1368 (13.07.1989)`an di demekê de ku ji bo çareseriya aştiyane ya pirsa Kurd digel hejmarek ji nûnerên rejîma Îslamiya Îranê di Viyenê de gotûbêj dikir, digel hevriyê têkoşer kak Ebdullah Qadirîazer endamê Komîteya Navendî ya PDKÎ bi destên bi nav nûnerên rejîma Îranê hatin şehîdkirin. Di vê terora necamêrane de Dr. Fazil Resûl kurdê Îraq û mamostayê zanîngehê jî, bi destên terorîstan hate şehîdkirin.

Wezîfedarên şaredariya Ciwanroyê êrîşî ser destfiroşekî dikin

Wezîfedarên şaredariya Ciwanroyê êrîşî ser destfiroşekî dikin, û difna wî dişkînin.



Li gora nûçeya ku gihîştiye nûçegihaniya "Kurdistanmedia"yê, roja Sêşemiyê 25`ê Banemerê Wezîfedarên şaredariya Ciwanroyê alav û tiştên destfiroşekî dişkînin, û piştre li wî jî dixin, û difna wî dişkînin.

Eva yekem car nine ku Wezîfedarên şaredariyê êrîşî ser kasibkar û destfiroşan dikin, û ser-barê bêhurmetiya bi wan, tiştûmiştên wan jî dişkînin, yan jî dest bi ser de digrin.

Xelk li kurdistanê bi sedema hejarî û bêkariyê neçar dibin ku hawara xwe bo karî destfiroşiya li ser kolanan bibin, ku gellek caran digel êrîşa wezîfedarên şaredariyê berbirû dibin.

Kurdistana Îranê bi sedema piştguhxistina ji aliyê rejîmê ve, di pileya yekem ya bêkariyê di Îranê de ye, bi taybetî navçeyên sînorî ên Kurdistanê ku ji bo bijîwa jiyana xwe neçar dibin hawara xwe karê bizehmet û îza û metirsîdar ê kolberiyê bibin.

"Instagram"ê rûpela terorîstekî rejîma Îranê daxist

Tora civakî ya "Instagram" a fermandê hêza Quds a Spaha Pasdaran, piştî êrîşên rejîma Îranê li Sûriyê li dijî Îsraîlê hate daxistin.

Li gora raporên belavkirî rûpela "Instagram" a Qasim Silêmanî fermandê hêza Quds a rejîma Îranê, piştî vê ku di xaka Sûriyê de êrîşî ser Îsraîlê kir, hate daxistin.

Li gora raporên belavkirî, rûpela "Instagram" a terorîst Qasim Silêmanî piştî vê hate daxistin, ku navbirî wêneyê jinavçûna Îsraîlê belav kiribû.

Pêştir jî rûpela "Instagram" a navbirî bi sedema belavkirina wêne û fîlmên weha hatibû daxistin.

Roja Pêncşemiyê 20`ê Banemerê hêza Quds a rejîma Îranê 20 roket avêtibûn binkeyên leşkerî ên Îsraîlê li bilindahiyên "Gulan"ê, û sîstema bergiriyê ya naskirî bi "Gunbeda Hesinîn" a Îsraîlê rakêt teqandin.

Îsraîlê roja Çarşemiyê binkeyên rejîma Îranê bombebaran kirin, û li gora gotina berdevkê arteşa Îsraîlê, zêdetir ji 310 pasdar di encama vê êrîşê de hatin kuştin.

Rikeberî û şerê di navbera Îsraîl û rejîma Îranê di xaka Sûriyê de, piştî vekişiyana Amerîka ji Bercamê tundtir bûye, û çend demjimêran piştî êrîşên rejîma Îranê bo ser Îsraîlê, Sky Newsê ragehand: "Îsraîlê çendîn binkeyên leşkerî di xaka Sûriyê de bombebraan kirine, ku pêk tên ji: navçeya "Cimraya" û "Elkeswe" ku piraniya pasdarên ser bi rejîma Tehranê di vê navçeyê de ne".

Diyardeya xwekuştinê di Kurdistanê de dom heye

Di doma diyardeya xwekuştina hevwelatiyan di Kurdistanê de, du ciwanên xelkên bajarên Kamyaran û Urmiyê dawî bi jiyana xwe anîn.

Li gora nûçeya gihîştî Ajansa "Kurdpa"yê, roja Pêncşemî 27`ê Banemerê, ciwanekî Kurd yê xelkê bajarê Kamyaranê, bi sedemeke nediyar dawî bi jiyan xwe anî.
Nasnameya vî ciwanê Kurd "Armîn Qubadî", kurê "Mensûr Qubadî" xelkê gundê "Lonî Sadat" a girêdayî bajarê Kamyaranê hatiye ragehandin.

Ji aliyekî din ve, demjimêr 5`ê êvariya roja Pêncşemiyê kedkarekî Kurd yê ku di şehreka "Îslamabad" a bajarê Urmiyê, ku di kargeha kabînêtsaziyê de kar dikir, xwe lidar vekir.

Herçend ku nasnameya vî ciwanê kedkar yê Kurd nehatiye zelalkirin, lê çavkaniyên xwecihî bas ji vê kirine ku, vî ciwanê Kurd bi sedema nebaşbûna rewş û derbazkirina jiyanê dawî bi jiyana xwe aniye.

Ji aliyekî din ve jî, keçeke ciwan û temen 17 salî, xelkê gundê "Tazava" ya girêdayî devera "Hîlîlan" a ser bi parêzgeha Îlamê, bi sedema destengî û hejariya malbatê, nekarîbû navê xwe ji bo çûna zanîngehê binivîse, eva di demekê de ye ku ev keça Kurd di hemû devrên dersa xwe de, ji bo çûna zanîngehê serkevtî bibû, lê ji ber destengiya malbatê, dawî bi jiyana xwe anî.

Civaknas û şarezayên warê derûnî, li ser vê baweriyê ne ku, hejarî, destengî, hebûna bêhêvîbûnê di nav ciwanan de, sedemên serekî yên diyardeya xwekujiyê di nav zarok û ciwanan de tê hesbandin.

www.arsivakurd.org

Ferhenga herî têrûtejî ya Kurdî-Farsî derket

Ferhenga herî têrûtejî ya dîroka wêjeya Kurdî ya bi navê "Ferhenga Zanîstgeha Kurdistanê" bi hewldanên Xaneya Lêkolînan a Kurdistannasî ya Zanîngeha Sineyê, roja 9-ê Gulanê bi merasîmekî hate nasandin.

Ev ferheng wek ferhenga herî berfireh û têrûtejî ya Kurdî-Farisî ya dîroka wêjeya Kurdî tê dîtin û ji 4 bergan pêk tê. Karê amadekarî û serpereştiyê ji aliyê Macid Rûhanî ve di nava 10 salan de hatiye kirin.

Rêveberê Xwendina Bilind a Kurdî ya Zanîngeha Sineyê Dr. Bextiyar Secadî di merasîmê ragihand: "Yekemîn ferhenga Kurdî beriya 330 salan ji aliyê Ehmedê Xanî ve hate nivîsandin ku navê wê Nûbihar bû. Duyemîn ferhenga Kurdî jî 140 sal piştî Nûbiharê deket ku ew jî ji aliyê Şêx Marfî Nodê ve hatibû nivîsandin."

Bi gotina Secadî ji sedsala 20ê heta niha zêdetirî 100 ferhengên Kurdî hatine nivîsandin ku piraniya wan ferhengên nav û yên têgehan in. Secadî diyar kir, ku 20 ferhengên Kurdî yên bi vî awayî nînin û ya herî giring jî Henbaneya Borîne ya Hejar Mukiryanî ye.Bextiyar Secadî ku di dema amadekirina projeya ferhengê de çavdêr bûye, got, "Ev ferheng ferhenga herî bêwêne ya derbarê dîroka wêjeya Kurdî de ye." Xaneya Lêkolînan a Kurdistannasî ya Zanîngeha Sineyê di sala 2000î de hatiye damezrandin û heta niha 35 pirtûkên derbarê çand, wêje û dîroka Kurdî de çap kirine. Rudaw

Ciwan Haco: Piştî du hefteyan albûmeke nû belav dikim

Ciwan Haco diyar dike ku piştî du hefteyan dê albûmeke nû belav bike ku karên xwe yên dawî yên ji bo albûma nû temam kiriye, lê ji bo karên hunerî navber nade û ji bo ku piştî payîza îsal albûmeke din derxe, dixebite.

Ciwan Haco di sala 1957an de li bajarokê Tirbespiya Rojavayê Kurdistanê ji dayîk bûye, di sala 1979an de ji warê xwe derket û li Almanyayê nîştecih bû. Dema ku li cihên giştî dest bi gotina stranan kir 17 salî bû û heta niha 15 albûm belav kirine û piştî du hefteyan dê albûma xwe ya 16mîn belav bike.

Navê albûma nû: FELEK

Ciwan Haco li ser albûma xwe ya nû ji Rûdawê re ragihand: "Navê albûma min a nû 'Felek' e û bi 12 stranan pêk tê. Ez ê piştî du hefteyan bi awayekî dijîtal belav bikim."

Albûma xwe ya yekem di sala 1970 de bi navê "Emîna" belav kiriye û albûma wî ya herî dawî jî, ku di sala 2012an de hatiye belavkirin "Veger" e. Herwih Ciwan Haco di dema şerê DAIŞê de jî ji bo Pêşmerge stranek kire klîp.

Stranek ji bo Şehîd Şîfa Gerdî

Ciwan Haco bû salek bi albûma "Felek" ve mijûl e ku Tora Medyayî ya Rûdawê sponsorê wê ye. Haco diyar kir ku di albûma wî ya nû de stranek ji bo Şehîd Şîfa Gerdî amade kireye ku Şîfa Gerdî di 25/2/2017an de li Mûsilê ji ber teqîna bombeyeke DAIŞê şehîd bû.

Haco diyar kir: "Bi şehîdbûna Şîfa gelek dilgiran bûm. Şehîd Şîfa bû sembola şehîdan. Şehîdbûna wê li cîhanê deng veda. Ez ji ber ku di albûma xwe ya nû de min ji bo wê stranek gotiye, bextewer im." Teksta stranê Cano Şakir nivîsandiye. Ciwan Haco eşkere kir ku ew dixwaze di demek nêz de vegere Başûrê Kurdistanê û strana Şehîd Şîfa bike klîp.

Strana ji bo Şehîd Arîn Mîkran

Herwiha Ciwan Haco şervanên şehîd ên Rojavayê Kurdistanê jî ji bîr nekirine û di albûma xwe ya nû de stranek ji bo Şehîd Arîn Mîrkan gotiye. Arîn Mîrkan ku endama Encûmena Leşkerî ya Yekîneyên Parastina Gel (YPG) bû, roja 5ê Cotmeha 2014an de di êrişeke xwekujî de li girê Mîştenûr, zêdetirî 70 çekdarên DAIŞê kuştin.

Ciwan bû 39 sal li Almanyayê nîştecih e, li wir sê sal li Zanîngeha Bochum beşa muzîkê xwendiye û ketiye bin bandora muzîkjenên Alman, ev jî bûye sedema wê yekê ku bi muzîka klasîk a Kurdî û bi taybetmendiyên muzîka pop û rock a Ewropî, şêwazeke taybet ji bo xwe çêbike.

"Her kes dê xwe di vê albûma min a nû de bibîne"

Li ser ciyawaziya vê albûmê ji albûmên wî yên berê, Ciwan Haco eşkere kir: "Gelek ciyawaz e. Her kes dê xwe têde bibîne, klasîk, modern, ji rîtmên erebesk, rock, pop, cazz, hemû têde hene." Haco herwiha got: "Em ê albûmê bi awayî dijîtal, bi rêya înternetê belav bikin. Ez ê tenê 500 heb CD kopî bikim, ew jî ji bo diyarî ye."

Ciwan Haco li ser sedema belavkirina albûmê bi rêya înternetê dibêje: "Tiştekî bi navê bazara muzîka Kurdî tine ye. Bazirganiya muzîka Kurdî bi sifirê re yeksan e."

Di sala 2004an de rê ji Ciwan Haco re hat vekirin ku li bajarê Êlihê yê Bakurê Kurdistanê konsertek saz bike. Nêzîkî 200 hezar kes di konsertê de amade bûn. Konsertên Ciwan Haco kêm in, li ser sedema wê jî Haco dibêje ku "Kurd hêj hînî konsertan nebûne".

Ciwan Haco li gel stranbêja navdar a Kurd Hulya Avşar ku ji Kurdên Bakurê Kurdistanê ye û li Tirkiyê navdar e, bi awayê duet stranek xwendibûn, li ser amadekirina dueteke din eşkere kir ku di vê albûmê de jî duetek heye lê vê carê, ne li gel Hulya Avşar e, li gel stranbêja Tirk 'Bilge' ye. Haco diyar kir: "Rêveberê karên min ew xanim pêşniyar kir û got ku hunermendeke gelek baş e, wisa jî bû, çimku herçiqas Kurdî nizanibû, teksta stranê ya bi Kurdî gelek xweş xwend, bi rastî ez mat mam."

Ciwan di sala 1999an de bi xanimeke Ayslandî zewiciye û bavê du keçên bi navên Lorîn û Roza ye. Ciwan Haco ku bi stranbêjiya sirûdên niştimanî hat nasîn, piştî zewacê awaz û tekstên stranên wî gelek guherîn. Ev ji ber wê yekê ye ku berê gotibû: "Em Kurd bi awayekî giştî guherîn. Berê me şerm dikir, lê îro pêwîstiya me bi amrazên din heye. Divê em ji kevneşopî sûd werbigrin. Pêwîstiya me bi fîlmên rind, muzîkên baş û şanoyên xweş heye. Divê em îsbat bikin ku em dikarin behsa evîn û seksê jî bikin, neku her siyaset."

Zewaca li gel jineke biyanî û bûna bavê du keçikan, sedemek bû ku jiyana diyasporayê hilbijêre û venegere Rojavayê Kurdistanê. Lê belê ew dibêje ku yek ji wan sedeman jî, "siyaset" bûye. Ciwan Haco dibêje: "Dema ku ez şaşiya siyasetmedarekî dibînim, nikarim neaxivim. Divê ez bibêjim ku Kerkûk û Efrîn ji ber şaşiya serkirdeyên Kurd ji dest çûn. Ji desthilatdarên Rojava bipirsin, Ciwan Haco çima venagere."

"Min bêriya Tirbespiyê kiriye"

Ciwan Haco herwiha got: "Ez gelek bêriya Tirbespiyê dikim, ji sedî sed dixwazim vegerim. Lê min li vir jiyaneke din ji xwe re çêkiriye, ji bilî wê min kariye li gel Bakur û Başûrê Kurdistanê peywendî daynim, lê ez nizanim çima ev têkelî li gel Rojavayê Kurdistanê çênebû."

Li gor Ciwan Haco rewşa hunerê li Rojavayê Kurdistanê xirab e û dibêje: "Niha taqeta xelkê ji bo hunerê nemaye, xelk di nav şer de ye, di dema şer de buhayê muzîk sifir dibe, niha li wir mirov li pey nan e, ne li pey stranan."

Haco dibêje: "Her çiqas karê min kêm bûye, lê hêj taqeta min a xebatê maye, niyeta min heye payîza îsal dest bi tomarkirina albûmeke din bikim."Rudaw

www.sisiwan.org

Zimanê Kurdî

Qursên Kurdî, A. Karabax

Mînak 523/1 : Parkît : -ane, -anî, -ka, -kî, -ê, -tir, hwd :

Çend bikaranîn :

a. Parkît : -ane

Edîbane(edîb + ane) ☐ Mem edîbane dipeyive.

Torane(tor + ane) ☐ Birayê wî torane digeriya.

b. Parkît : -anî

Wekanî(wek + anî) ☐ Diya Rewşenê hirî wekanî radixist.

Zûkanî(zûka + anî) ☐ Dema ku ew ji kaniyê dihat, zûkanî dimeşiya.

c. Parkît : -ka

Hêdîka(hêdî + ka) ☐ Destê xwe hêdîka bilind kir.

Zûka(zû + ka) ☐ Dema ku ew ji kaniyê dihat, zûka dimeşiya.

ç. Parkît : -kî

Êvarkî(êvar + kî) ☐ Azad êvarkî hat cem wan.

Mêvankî(mêvan + kî) ☐ Ew li cem wan mêvankî rûniştê.

d. Parkît : -ê

Biharê(bihar + ê) ☐Em biharê diçin zozanê.

Rojekê(rojek + ê) ☐ Ew ê rojekê bê mala we.

e. Parkît : -tir

Zûtir(zû + tir) ☐ Hun ê sibehê zûtir biçin bajêr.

Pirtir(pir + tir) ☐ Îşev ciwan pirtir hatin şanogehê.

Mînak 523/2 : Pêşkît : î- : Çend bikaranîn :

Îşev(î + şev) ☐ Îşev em li otelê dimên.

Îro(î + roj) ☐ Îro xwendekar ketin bêhndanê.

Qursên Kurdî, A. Karabax

6Îsal(î + sal) ☐ Îsal zarokên me dest bi xwendinê kirin.

Îcar(î + car) ☐ Karên wan îcar ne giran in.

Tiştonek

A: Mahir Berwarî

3. Ferqîn Melek Aykoç
- Pirr pelên sîs, navê wê lê nivîs, ji bo pênivîs, dikeve kîs.
(* Defter)

- Lastîkek nerm e, radike çivê qelem e. (* Jêber/Lastîk)

- Ne bi hest û gêjî, bi pîvan û mêjî, qelem a radihêjî, ji bo rastbe dirêjî. (* Rastkêş/ Mestere)

- Wekî şivan ê berxika, dinêre li zaroka, fêrdike hêdîka,zanîn û tiştika. (* Mamosta)

- Awayê max û holê, zaran re wek malê, kursî û mase li

- Li dibistan e, hîn ciwan e, li bendan e, divê bizane, dew û dozan e. (şagird/qutabî)

- Li dîwar e, ne kewar e, qor bi qor e, wekî per e, tişt li sere, ki nizane ew ker e. (* tereq)

Têdîtin: Amadekar destkariya devoka metelokan nekiriye

Xwendevanên hêja! Hûn dikarin bersiva tiştonekan bi riya E-Maila Agiri2003@gmal.com ji me re bişînin

www.arsivakurd.org

Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (326)

Xelkê Îranê hawara xwe bo kirîna zêr birine

Îraniyan di sê mehan de neh ton zêr kirîne, ku ew yek li ber bênirxbûna perê Îranê ye.

Îraniyan di kirîna zêr de rekord şikandin, û di zivistana 1396`an de, zêdetir ji neh ton zêr kirîne. Di demekê de ku xelkê welatekî wekî Misrê di sala 2017`an de, tenê 22 ton zêr kirîne. Hekî her bi vî rengî here pêş, di heyama salekê de ewê bibin meztirîn kiryarê zêr di Rojhilata Navîn de piştî Erebistanê.

Şêvra Cîhanî ya Dirav ragehandiye ku bênirxbûna pereyê Îranê sedema serekî ye ji bo kirîna zêr. Lewra diravê xwe yê kaş dikin zêr.

Serokê Yekîtiya Zêr û Cewahrên Îranê pêştir ragehandibû ku raporên nefermî nîşan didin ku xelkê Îranê 300-400 ton zêr di malên xwe de radigrin.

Serjimêriyên belavbûyî ji aliyê şêvra Cîhaî ya Zêr ve nîşan dide ku asta daxwazkirina kirîna şimşê zêr û sikeyan di Îranê de, di sê mehên destpêka sala 2018`an de gihaye 9.3 tonî, ku ew yek jimara herî zêde di sê salên borî de bûye.

Herwisa li gora vê raporê, bi sedema nîgeraniya zêde ya sermayedaneran ji egera tundtirbûna kêşeyan di pêwendiyên di navbera Amerîka û Îranê de, asta daxwazên bo kirîna sike û şimşê zêr zêde bûye.

Pirsgirêka bêaviya gola Urmriyê nayê çareserkirin



Berpirsên rejîma Îslamî a Îranê, pirojeya veguhastina avê, ji Turkiyê bo nav gola Urmiyê hilweşandin.

Nûçegihaniyên girêdayî rejîma Îslamî a Îranê, ji zarê birêveberê “Navenda Vejiyandina Gola Urmiyê” belav kiriye ku, wan tu bernameyek ji bo veguhastina ava gola bajarê Wan a ser bi welatê Turkiyê, ji bo gola Urmiyê tunînin, û herwisa em vê nûçeyê jî bi tu awayî erê nakin.

Her di vê pêwendiyê de, wî berpirsê rejîma Îranê eva jî daye eşkerekirin ku, bi sedema vê ku ava gola bajarê Wanê madeya kîmyayî heye, û ev digel ava gola Urmiyê yek nagrin, bi vê sedemê ew pirojeya hatiye hilweşandin.

Her di vê derheqê de, wî berpirsê rejîma Îranê bas jî kiriye ku, veguhastina ava çemê “Eresê” ji bo gola Urmiyê jî hatiye hilweşandin.

Tevî vê ku berpirsên rejîma Îslamî a Îranê îdi`a dikirin ku, asta ava gola Urmiyê bilind bûye, lê rapor bas ji vê dikin ku, asta ava gola Urmiyê li çav sala derbazbûyî 18.cm daketiye.

Herwisa wî berpirsê rejîmê gotiye ku: Tenê riya anîna avê ji bo gola Urmiyê, mifahwergitin ji bendava “Kanî Sêv”ê ye. Gola Urmiyê bûye goriyê siyasetên xirab û nerêde yên rejîma Îranê, û heyanî niha jî ji bo vejiyandina ava vê golê ku dahata xwazayî û samana neteweyî a Kurdistanê ye, tu gaveke pozêtîv jê re nehaitye hilgirtin.

Gola Urmiyê ev nêzîkî 40 salan e ku nîşaneyên nesaxbûna xwe nîşand dide, lê tu yek ji dewletên desthlatdar yên rejîmê ku hatine ser kar, heyanî niha tu riyek ji bo çareserkirina vê nesaxiya vê golê negirtine pêş.

Birrîna bi zorê ya porên keçên dersxwan dom heye



Serbarê vê ku tenê çend rojek bi ser nûçeya birrîna porên keçeke dersxwan re di xwendingeheke bajarê Abadanê de derbaz dibe, mamostayeke din li bajarê Fesa ya ser bi parêzgeha Fars dest daye birrîna porên 9 dersxwanên din ên keç di vê xwendingehê de.

Muslim Emînînijad berpirsê Perwerdehiya bajarê Fesa ya parêzgeha Fars serbarê piştrastkirina birrîna porên neh dersxwanên keç ên vê xwendingehê ji aliyê mamostaya wan ve, bas ji şandina karnas ji bo şopandina vê pirsê kiriye.

Roja 16`ê` Banemerê bû ku alîkara Perwerdehiyê ya xwendingehekê di bajarê

Abadanê de, bi hinceta vê ku porên keça dersxwan wê bala cihgirê berpirsê xwendingehê bikêşe aliyê xwe, porên wê kurt kiribû. Malbata wê dersxwenê piştî haydarbûna derheqê vê bûyerê de, li hemberî vê kriyara cihgêrê Perwedehiyê ya vê xwendingehê doz vekirin.

Hêjayî basê ye jî, ku hereketên bi vî rengî dibine sedema têkçûna aliyê derûnî, û dirustbûna zextê li ser dersxwanan.



Mana Nestanî

www.arsiv.ak